Têkelbûn

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Divê jin û mêr, bêyî cudahiya etnîkî, olî yan çandî, tev xwedî mafê wekhev, berpirsiyariya wekhev û derfeta wekhev bin. Em Sosyaldemokrat dixwazin, ku Swêd bi bingeha piralîbûnê (mångfald) were avakirinê. Bihevrebûn divê li ser bingeha rêzdariya li ber cihêrengbûnê, ya li nav çarçiveya nirxên bingehîn ên demokratîkî were avakirinê. Divê her kes xwe nêzîk bibîne û xwedî berpirsiyariyê be.

Li civata me ya î roj, pir kesên ji welatên cihêreng hene. Ev civata me hem dewlemend dike û hem jî pêşve dibe. Ji bo têkelbûn û cihêrengbûniyê piştgiriyek xurt heye. Lê her wisan jî dijwariyên mazin hene. Swêdiyên ji koka xwe ji welatek derve ne, hîna jî pêşberî gelek dijwariyên wek hizrên xwedî biryara pêşîn dibin û li nemafiyan rast dihên. Kesên ji welatê din hatine Swêdê bi giştî ji kar bêpar in. Me navê, ku ev nemafî berdewam bin. Ji lewre em Sosyaldemokrat, me hin amadekarî hene, ku em têkelbûna civakî baştir bikin, em nemafiyan ji holê rabikin û xebat û karguzeriyê pirtir bikin. Pir tişt baştir bûne. Lê ev ne bes e û me hîna gelek kar heye.

Xebat bingeha têkilbûnê ye
Xebat bingeh e hem ji bo têkelbûnê û hem jî ji bo pêşketina aboriyê. Her wisan jî xebat xwedî wateyek mazin e ji bo desthilatdariya mirovî li ser jiyanê. Li Swêdê me pir daxwaziyek mazin heye, ku ew kesên li vir dibin xwedî mafê rûniştin û mafê xebatê, ew bikaribin zû bi zimanê swêdî bipeyivin û bibin xwedî kar. Em berî her tiştî dixwazin, ku ji bo têkelbûnê derfetna peyda bikin û bi giştî civata xwe xurt û ciwan bikin.

Me mişe karguzerî hene, ku em di nav wan swêdiyên ku li derveyî welêt hatine dunyayê lebatê bêhtir bikin. Ji sala 1994’ê vir ve lebata di navbera kesên, ku li derveyî Swêdê hatine dunyayê ji 6% yekîneyan

bêhtir bûye. Lê ev ne bes e. Pileya bêkariya li nav wan kesên li derveyî Swêdê hatine dunyayê, ne tenê dihêt wê wateyê, ku xelk pêşberî gelşên debara jiyanê dibin, her wisan ev dihêt wê wateyê, ku jêhatîbûnên li nav van kesan jî her bi vî rengî heba dibe. Em dixwazin çareserkirinan pêk bihênin ku li gor pêwîstiya her kesekî be.

- Em alîkarî ji bo komeleyên îdeel dikin, ku ew pêwendiyên xwe bêhtir bi kar bihênin, da ku jin û mêrên bi wan ve girêdayî hêsantir werin nav bazara xebatê.
- Perwerdeya zimanê swêdî wê baştir bibe û li gor rewşa xwendekarê bihêt cîbicîkirinê, ku mirov zû bikaribe swêdî hîn bibe û bibe xwedî kar. Nuha karguzeriyek li dar e, da ku jêhatîbûna mamosteyên penaberan ji bo zimanê swêdî di xebata xwe de xurttir bibin.
- Nuha me derfetên nuh ji bo nirxandina perwerdeya li derveyî welêt heye.
- Di bernameyek nuh a ji deh xalan pêkhatî de, hukûmeta Sosyaldemokratiyê ji bo bêhtirkirina lebata di nav kesên li derveyî welêt hatine dunyayê yek milyar kron veqetandiye

Zexmkirina xebata li dij lidervehiştinê
Hîna jî lidervehiştina kesên, ku ji kok û binyad ve endamê milletek, çandek yan olek cihê ne, diqewime. Lidervehiştin dihêt wê wateyê ku mirov qet jî ne maf û derfetên wekhev e. Ev bûyer derfetên jin û mêrên penaber ên ji bo ketina nav bazara xebatê û jiyana civatê bi sînor dike. Divêt helwestên welê li civatê werine guherandinê û me qanûn li dij her cûre helwêsta lidervehiştinê gerek e. Hukumeta Sosyaldemokratiyê loma ye ku li dij lidervehiştinê qanûnên hişktir pêşniyar kirine û ji Çavdêrê lidervehiştinê DO (diskrimineringsombudsmannen) re derfetên hîn mazin dane.

Pêşvexistina taxên ku rewşa wan ne baş e
Me ramyariyek taybetmend a ji bo wan taxên, ku rewşa wan ne baş e heye. Ji bo me Sosyaldemokratan pir pêdivî ye, ku pêwîstî li ku hebe, gerek em derfetê bidin wir. Ev dihêt wê wateyê, ku ji bo nimûnê; gava li xwendegehek kêmaniya şagirdan xwe digehînin amanca perwerdeyî ya pêdivî, hinge em derfeta wê xwendegehê bêhtir dikin. Em dixwazin bi piştgiriya dewletî bidin wan 100 dibistanên li Swêdê, ku herî pir pêwîstiya wan bi piştgiriyê heye û 1000 mamosteyên nuh û personelên din li wir bibin xwedî kar. Em dixwazin perwerdeya hevdem a şagirdiyê (lärlingsutbildning) li wan şaredariyên, ku pirtir xortên ji kok û binyad ve ji welatek din lê hene, hebe.

Alternatîva vê
Li hevberî vê ramyariya me ya, ku dibêje; divê her kes bêyî rewşa ku ji kok û binyad ve endamê milletek, çandek yan olek din e, bibe xwedî mafên, berpirsiyariyên û derfetên wekhev, Moderat û hevbendiya baskê rastê (högeralliansen) hene. Ew dixwazin budçeyên derfetên ramyariya bazara xebatê bi heşt milyar kronî kêm bikin. Pir dijwar e, ku bihêt famkirinê gelo ramyariyek welê çawa dikare lebata di nav ew kesên li

derveyî welêt hatiye dunyayê pirtir bike? Gava mirov ni karibe ji bo debara jiyana xwe bibe xwedî berpirsiyarî, hingê rewşa lidervehiştinê peyda dibe. Di heman rewşê de Moderat dixwazin bazara xebata mûçeyê kêm hîn kêmtir bikin bi bêgavhiştina xelkê ku bibin xwedî wan karên bi kêmmûçe, bêyî ku jêhatîbûna wan li ber çav bihêt girtin. Gelşa bi vê sîstemê ew e, ku mirov her çend xwedî perwerdeyek çak be, dîsan jî jinavderketina mirovî ji nav vê rewşa xirab dijwar e.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?